## Daxuyaniya Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê derheq yekem salvegera avabûna vê navendê

»»» R:3






## Daxuyaniya Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê


»»» R:12

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (342)20-01-2019 Buha (1000) Tûmen*

## Rejîma Îranê ketiye tengasiyê de



**Roja 26`ê Befranbarê serokê Stratejiya Pêwendiyên Derve ên Rejîma Îranê di hevdîtina digel heyeta "IAI", rexne li şêwaza reftara Ewropiyan bi taybetî derheq karûbarên malî ên taybet bi bazerganiya digel Îranê naskirî bi "SPV" girt, û ragehand: Dewletên Ewropî hêz û şiyana piştevanî û rênîşandana bi kompaniyan bona alîkariya bi Îranê re tunînin.**

Kemal Xerzaî serokê Stratejiya Pêwendiyên Derve ên Rejîma Îranê ragehand ku şikesta Bercamê beramber e digel têkçûna ewlehiya Ewropayê!!. Wî herweha got ku Amerîkayê bi hemû hêza xwe Ewropa wekî rehînekê girtiye, û Ewropî dibe ku dersa berbirûbûna digel Amerîkayê, ji me û Çîn û Rûsiyê ve hîn bibin.

Ew axavtinên Xerazî di demekê de ne ku di roja 18`ê Befranbarê de, heyeteke Ewropî pêkhatî ji welatên Feranse, Birîtaniya, Almanya, Danmark, Hulend û Biljîkê, di avahiya Wezareta Derve ya rejîma Îranê de, daxwaz ji aliyê Îranî kirin ku dibe dev ji pirograma xwe ya mûşekî bîne, û ew nikarin êdî çavpoşiyê ji vê pirograma mûşekî ya Îranê bikin.

Êdî berpirsên rejîma Îranê, digel bêhurmetîkirina bi vê heyetê, ew jî berevajiyê deb û resmên dîplomatîk, cihê civînê bi cih hêlabûn, ku vê yekê dengvedaneke zaf di ragehandinên giştî de hebû.


Navneda lêkolînan a meclisa rejîmê jî ragehandiye: Kompaniya neftê ya Îranê di sala borî de 48 milyard û 660 milyon Tûmenî deyndar bûye, ku bi sedema nebûna bûdceya hewce, dibe 15 milyard û 700 milyon Dolarî di sala 1398`an de bide.

Rojnameya "Financial Times" taymz ê nivîsandiye: Amar nîşan didin ku dorpêçên Amerîkayê derbeke giran li kerta şandina derve ya nefta rejîma Îranê daye, ew hinartina nefta Îranê li çav demsala buharê %60 kêm bûye.

»»» R:2


## Heybetek ku naşkê

»»» R:2



## Komara Kurdistanê berhrmeke mayînde ji bo Kurdan!

»»» R:6




## Axazadeh û zarokên dewlemendên Îranê ...

»»» R:4



## Nûriyê Tirkîzan!

»»» R:5



## Fobiyaya kurd

»»» R:7




## Kurdistana Sûriyê di navbera helwesta Amerîka û ...

»»» R:8



## Sergotar

# Heybetek ku naşkê

N: Kerîm Perwîzî

Di dîroka neteweyên bindest û belengaz û bi giştî ew neteweyên ku dijminên gellek dilreq hene, hindek beşên taybet peyda dibin, ku dijminên vê neteweyê hewlên gellek binecî didin, ku vê qonaxa taybet sivik û lawaz bikin.
Bo mînak dema ku spîpêst li Ewropa diçin Amerîkayê, û dixwazin ku xaka sorpêstan dagîr bikin, her cure berbirûbûn û xweragiriyeke sorpêstan bi navê hovîtî û paşvemayîn û hovîtiya sorpêstan ji nav dibin, û hêceteke bo kiryarên xwe tînin.
Yan li Îrana serdema îdeolojiya Pehlewî-Xomênî de, xweragirî û xweradestnekirina neteweyên Turk û Kurd û Ereb û Belûç û Turkemen bi dijberîkirina digel şaristaniyetê û digel xwedê û îxanet bi dayka nîştiman (Mami Mîhen) hate binavkirin, û qonaxên hestiyar ên dîroka van gelan wekî destçêkiriyê biyaniyan û sivik nîşan didin.

Di wêneya taybetî ya Kurd de, dema ku di lûtkeya faşîzmê û paşveman û serberedayîtiyê di navçê de, Kurdistan di sala 1324-an de deshilata Komarî bi awayekî demokratîk radigehîne, ew yek xaleke girîng a guherînê ye di Îran û Kurdistanê, û heta Rojhilata Navîn de jî.

Dema ku Rizayê Mîrpenc deshilata bi nav modern a xwe ava dike, mdernbûnê di rûtbûna jinan de dibîne, û jin û keçên wî serpoşa xwe radikin û dibin mînaka mode û kincan.
Lê ku deshilata Komara Kurdistanê bi destê pêşewayê nemir û bi rêbertiya PDKÎ tê avakirin, Pêşewayê gel rêkxirawa tayet bi maf û pêgehandina jinan ava dike û hevjîna wî dibe mînaka xebatkariyê di pêxema yeksaniya heqîqeta jin û mêran di nava malbat û civakê de.

Ew deshilata biheybet a neteweyî- demokratîk e li kurdistanê û li serdema cilîdanêya paşvemayîn û faşîzmê di navçê de, qonaxeke pirr şanazî bo neteweya Kurd e, û kerbê vêde ye ku dijminên hûr û gir ê Kurd û PDKÎ berdewam di hewla sivikatîkirina wan de bûne û berdewam xwastine wê wekî paşbendeke xwestek û berjewendiyên Baqirof û Pîşewerî û şerê çend eşîran bi nav bikin.

Lê ew xwehilkutana dijminên Kurd qet serkevtî nebûye, û dehik bi dehik, Kurd û Kurdistan zêdetir ketine pey hez û xwezî û daxwazên rewa ên PDKÎ û Komara Kurdistanê, û niha êdî takê Kurd şanaziyê dikin ku xwe wekî hevwelatiyekî Komara Demokratîk ya Kudistanê pênase bikin. Nasname û pênaseyeke neteweyî û nîştimanî ku cudatir ji pêvajoya dîrokî, serberedayî û hovîtiyê di navçeyekê de ye, û Kurd û Kurdistanê dike gewhereke geş di dîroka dûr û nêzîk de.

Ew mezinahî û heybeta Komara Kurdistanê û rêberên pir biheybet ên wê û bi taybetî Pêşewayê wê yê nemir, kelheke biheybet e, û dîwareke çiyayî heye, û li dewra bajar e, ku dujminên wê, hindî ku zêdetir xwe hildikutin da ku sivikatiyê pê bikin, xwe zêdetir sivik dikin, û berev ketina nav qofiyê de diçin û Komar di nava bîr û hizra takên nîştimana Kurdistanê de qahîmtir dibe, û bicoştir ji caran derdikeve.

»»» **Doma manşetê**

Berpirsê polîsê Tehranê Husên Eşterî ragehandiye, ku em agehdar in ku dijminên Tehranê dixwazin di merasima 22`ê Rêbendanê de li dijî rejîmê meşekê bi rê ve bibin, û ji birêvebirina meşeke weha ya nerazîbûnê em nîgeran in!.
Li gora axavtinên berpirsên polîsê Tehranê, hevdem digel vê ku dixwazên evsal jî, şanoyeke rêpîvanê bi rê ve bibin, lê tirsa wan ew e ku ew civîna xelkê, û kombûna wan li dewra hevdu, vegere dijî wan, û rêpîvana hikûmetî bibe meşa xelkê li dijî hikûmetê, û her ji niha ve gefan dixwin, û hewla çavtirsandina xelkê didin.
Koma van bûyer û axavtinan û nîşandana nerazîbûnan bi taybetî di nava tex û qatên curbicur ên welat de (her carê jî li cihekî welat) nîşana vê yekê ne, ku her wek ku beşek ji mohreyên rejîmê bixwe bas kiribûn, Komara Îslamî di naweroka xwe de mayepûç bûye, û mijûlî derbazkirina dewrana betallbûna xwe ye.

# Şandeke PSK`ê serdana PDKÎ kir

**Şandeke PSK`ê bi serperestiya Mes`ûd Tek serdana Desteya Kargêrî a PDKÎ kir.**



Li gora nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdistanmedia”yê, roja Çarşemiyê 26`ê Befranbara 1397`an a Rojî, şandeke PSK bi serperestiya Mes`ûd Tek serokê giştî ê PSK, serdana Desteya Kargêrî a PDKÎ kir, û ji aliyê şanda PDKÎ bi serperestiya Mistefa Hicrî ve, hate pêşwazîkirin.

Di vê hevdîtina dostane de, herdu aliyan baseke têr û tejî li ser rewşa her çar parçeyên Kurdistanê, û herwisa pêwendiyê di navbera PSK û PDKÎ kirin.
Di dawiyê de jî, her du aliyan pêdagirî kirin, li ser berdewamiya têkiliyên dostane.

## Şandeke PDKÎ di merasima şîn û taziya mamosta Mihemedê Mela Qadir de beşdarî kir

**Şandeke PDKÎ bi serperestiya Mihemednezîf Qadirî beşdarî di taziya xwedêjêrazî mamosta Mihemedê Mela Qadir têkoşerê mêjîn ê PDK`ê de kir.**



Piştînîvroya roja Çarşemiyê 26`ê Befranbarê şandeke PDKÎ bi serperestiya Mihemednezîf Qadirî cihgirê duyem ê Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ, beşdarî di taziya kesayetiyê naskirî û têkoşerê mêjîn ê PDK mamosta Mihemedê Mela Qadir li bajarê Hewlêrê de kir.

Şanda PDKÎ tevî pêragehandina hevxemiyê, bi dost û hevalên PDK`ê, û malbata mamosta Mihemedê Mela Qadir, nameya sersaxiyê ya Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ pêşkêşî wan kir, ku bo Mes`ûd Barzanî şandibûn.

# Daxuyaniya Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê derheq yekem salvegera avabûna vê navendê

**Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê derheq yekem salvegera avabûna xwe daxuyaniyek weşand.**

Deqa tewaw ya vê daxuyaniyê weha ye:

Xelkê xebatkar û bêzarbûyî ê Kurdistanê!
Hêz û aliyên siyasî ên Kurdistanî û Îranî!

Heyama çil salan e ku Komara Îslamiya Îranê şerekî bêrawestiyan di hemû biyavan de (siyasî, leşkerî, civakî, aborî, çandî) bi ser gelê Kurd de li Kurdistana Îranê de sepandiye. Rejîm bona serkevtina di vî şerî de, û serkutkirina gelê Kurd ji hemû alav û emrazên tundûtîj mifah wergirtiye û ji riya dem û dezgehên xwe ên serkutkar ve hewl daye ku hemû kuncên jiyana xelkê Kurdistanê bixe bin çavdêriya xwe de, lê di heyama van çil salan de, xelkê Kurdistanê di gel vê yekê de ku şer neberamber bûye, lê bi hemû şiyana xwe xebat li dijî vê rejîmê kirine, û li ser xebat û mafxwaziya xwe pêdagir bûne. Di vê berêkaniyê de digel deshilatdariya Komara Îslamî de hizbên siyasî ên Kurdistana Îranê ji riya Hêza Pêşmerge û teşkîlata navxwe a welat û herweha bi piştevanî û erk û wezîfe wergirtina xelkê welatparêz û çalakên siyasî ên Kurd li Kurdistan aÎranê berbirûyê siaysetên Komara Îslamî bûne û di vê riyê de bi hezaran pêşmerge û endamên hizban û xelkê sivîl û medenî ên Kurdistanê şehîd bûn û xwîna wan bi neheqî niqitî ser erdê. Lê digel hemû vê fedakarî û qurbanîdanê hemû demekê hest bi valahiya vê hatiye kirin, ku tevgera gelê Kurd li Kurdistana Îranê bo berevanî, û xebata li dijî deshilatdariya Komara Îslamî yekdest û yek bername nîne, û eva xaleke lawaz ya tevgera berheq ya gelê Kurd e.

Digel vê yekê de di salên borî de hewla vê yekê hatiye dan ku ji riya civînên hizbên Kurdistana Îranê li dewra pilatformekê ku nûneratiya piraniya xelkê Kurdistanê bike, bereyek yan hevalbendiyek pêk bê, û ew valahî di xebata li dijî Komara Îslamî bê tejîkirin, lê bi sedemên curbicur nekarîne vê hevalbendiyê pêk bînin. Diyare ku hizbên qada xebatê yên kurdistana Îranê her yek ji wab bo xwe di vê armancê de ku pêkanîna hevpeymaniyeke kara be, xafil nebûn, û kar jê re kiriye, heya eva ku di roja 19`ê Befranbar sala 1396`an de (09.01.2018)`an de, piştî çendîn civînên du alî û çend alî biryara pêkanîna navedekê bi mebesta rêkxistina havkariya di navbera hizban de hate dan, û di roja 30 befranbar a sala 1396`an de vê navendê hebûna xwe ragehand û bi awayekî fermî dest bi karên xwe kir.

Niha salek bi ser pêkanîna vê navendê re derbaz dibe, û di heyama vê yek salê de vê navendê hewl daye ku pira pêwendiya di navbera hizbên Kurdistana Îranê be, û kar û tekoşîna bibandor li ser çawaniya pêşvebirina xebata heqxwazane ya Kurdistana Îranê hebe.

Çê dibe ku ji çend aliyan ve girîngiya Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê em binirxînin. Yekem, ew navend di rewşekê de pêk hat ku rêkxistina eşkere û rêberiya PDKÎ bi sedema rewşa siyasî ya herêmê, heyameke zemanî ya zêde ye heya asteke berçaw meydana xebatê jê teng bûye, û rojane jî bi sedema siyaseta zêde xwaziya Komara Îslamî di herêmê de, ew bertengiye bi başî xwe nîşan dide. Û ji aliyekî din ve jî renge bi sedemên curbicur tu yek ji wan hizban bi tenê nekarîne ku li hember siyaset û pilan û pîlanên Komara Îslaî de bisekinin.

Duyem: Hecehiya navendeke weha di rewşekê de bû ku li Îrana li jêr deshilata Komara aÎslamî de bi sedema siayseta dijî xelkî di navxwe ya Îranê û siyasetên dujminkarane derheq bi welatên cîran ji riya hinartina derve ya şoreşa Îslamî û destêwerdan di nava karûbarên navxwe a wan welatan bûye kabûsek bi ser milên gelên Îranê û nezma cîhanî.
Di navxwe ya welat de jî nerazîbûn û meşên di van du salên dawiyê de, zêdetir bûne, bi awayekî ku di van nerazîbûnan de xelkê bêzar ê Îranê xetên sor ên nizama Komaar Îslamî bezandine, û “mirin bo rêber” û “hiloşe Komara Îslamî” di hemû meşan de tê bihîstin. Piştî salekê derbazbûn bi ser vê xwenîşandan û nerazîbûna gelên Îranê de, em dibînin ku rewş di zirara Komara Îslamî û berjewendiya gelên Îranê de ye û rojane tex û qatên civaka Îranê wek kedkar, xwendekar, jinan, mamosta û xelkê asayî bona bidestveanîna mafên xwe têne ser şeqaman û bi dana diruşman li dijî deshilatê nerazîbûna xwe nîşan didin.

Cuda ji nerazîbûna gelên Îranê rejîm bixwe jî di navxwe de rastî kirîzan hatiye, û di yek sala borî de baskên nav rejîmê de zêdetir ji hemû demekê berbirûyê yektir bûne, û kar û kiryarên wan ên qirêj ku di heyama çil salên borî de li dijî gelên Îranê û serwet û samana vî welatî kirine li ser yek eşkere bikin.

Serbarê vê rewşê bêserûberî di navxwe ya Îranê de, siyaseta vegeşandina deshilatdariyê û destêwerdan di nava karûbarên navxweyî ên welatên navçeyê, û pêdagirbûna li ser destpêregihîştina bi çekên komkuj û pêbendnebûna bi peymanname û gellek rêkkevtinên navdewletî û binpêkirina mafên mirovan, Îrana li jêr deshilata Komara Îslamî xistiye nav tengasiyeke mezin ku renge vê carê bi hêsanî nekare jê derbaz bibe. Di rewşeke weha de bi encamgihîştina tevgera mafxwaane ya xelkê Kurdistanê hewcehî bi yekîtî û hevpeymaniyekî Kurdistanî zêdetir ji derbazbûyî heye.

Li ser vê bingehê Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê di heyama yek sala borî de kariye ku gellek astengiyan li ser riya xwe vêde bide, û bi pesendkirina pêrewa navxwe û xetên giştî û helwestgirtin di hemberî wan bûyerên ku di Îranê bi giştî û Kurdistana Îranê bi taybetî rû didin, bo mînak wek bangewaza alîkarîkirina xelkê erdhejlêdayî ên navçeya Kirmaşanê, nerazîbûnnîşandan li ser îdamên siyasî, kuştina kolberan û kiryarên terorîstî ên Komara Îslamî û hwd…xwe wekî karektereke qada xebata li dijî Komara Îslamî li Kurdistana Îranê nîşan bide, û bibe cihê hêviya dilsojên yekîtî û yekgirtîbûna Hizbên Kurdistana Îranê.

Kopka vê xemxwarî û bi hawardehatina xelkê Kurdistanê di 21`ê Xermanana îsal tenê piştî sê rojan derbazbûna bi ser mûşekbarana binkeyên PDKÎ û Hizba Demokrata Kurdistanê, û hevdem îdama şeş çalakên siyasî di girtîgehên Recayîşehr a Tehran, Miyandoaw û Şinoyê bi zelalî bo dost û dujmin derket ku piştî çil salan siyaseta serkutkirina berdewam ya xelkê Kurdistanê ji aliyê dem û dezgehên Komara Îslamî û hewla veqetandina xelkê û hizban, xelk bi gireveke sertaserî li hizb û xortên hizbê bûn xwedan, û nîşan dan ku hekî di nava hizbên qada xebatê de yekgirtin hebe, xelk yar û piştevanê van hizba dibin.

Di salvegera avakirina Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê em daxwaz dikin ku hizbên din ên Kurdistana Îranê jî ku bername û pirograma xwe di çarçoveya xetên giştî ên Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê de dibînin, bona bihêzkirina vê navendê û berew pêkanîna eniyeke bihêz û bişiyan tevlî Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê bibin.

Di heman demê de Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê destê hevkariyê bo hemû wan hizb û rêkxirawên siyasî ên ên opozisyona Komara Îslamî dirêj dike, ku bi kiryar baweriya wan bi demokrasî û çendneteweyîbûna Îranê heye, û mafê neteweyan di siberoja Îranê û sîstema birêveberiya welat di Îrana siberojê de qebûl dikin.


Em hêvî dikin ku bi hevkariya hemû alieykî em hewl bidin ku sîstemeke komarî, demokrat û federal ku bibe cihgir bo komara Îslamî û hemû gelên Îranê li jêr stem û çewsandina vê rejîmê rizgar bin.

**Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê**

**19.10.1397**

# Axazadeh û zarokên dewlemendên Îranê bi navçavdana milk û malên xwe, bûne sedema nerazîbûna xelkê





**N: Erin Cunningham**

**The Washington Post**

**W: Hemîd Muxtarî**

Şewaza jiyana zarokên dewlemend yên berpirsên Îranê, weke te`itîlatên pirxerc, mêhvandariyên xweş û destgihîştin bi pere û kar, bûye sedema acizbûna xelkê di mehên dawî de, piştî ku baykotên dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bandora xwe xiste ser abûriya Îranê û heta astek bilind abûriya Îranê felec kir.

Ciwanên dewlemend, bitaybetî yên ku pêwendiyên wan ligel berpirsên dewletî hene, yan xizm û kes û karên berpirsên dewletî ne, ji rêya Instagramê ve û di xiyevanên Tehranê de, dewlemendiya xwe didin nav çavê xelkê, bi rêya danîna resmên xwe bi tirombîlên sport û giranbiha, kincên marke û te`itîlatên pirxerc li hotêlên 5 stêrk û giranbuha.

Ev qata taybet li civakê de, roj bi roj dibin xwedî postên bilind di nava dewletê de, û bûrsa xwendinê di zanîngehên cîhanî de werdigirin, û hatin û çûna wan bo derveyî welat bê problem tê encamdan.

Li gorî wan wêneyên ku ji neviya Xomêynî, rêberê berê yê Komara Îslamiya Îranê li Lendena Berîtaniya hatiye girtin û belavkirin, tênê kîfê destê wê, 3.800 Dolar nirxa wê bûye.

Lê îrorojê hejmarek kêm ji xelkê dikarin ji wan îmkanatan mifah bistînin û xweş derbaz bikin, ji ber ku hewcehiyên jiyanê roj bi roj girantir dibin û kîfê perê xelkê roj bi roj biçûktir dibe.
Xelkê Îranê îrorojê bi piranî bas ji neyeksanî û kultura xizm û eşîregerî dikin ku tenê bi qazanca girûpek destnîşankirî di Îranê de ye ku bi Axazade yan zarokên berpirsan hatine nasîn.

Meha derbazbûyî Kambîz Mehdîzadeh, zavayê Hassen Rûhanî, serkomarê Îranê, ku weke berpirsê Lêkolînên Erdnasî li Îranê hatibû diyarîkirin, tenê du rojn piştî bidestxistina vê postê, bi sedema nerazîbûna xelkê, neçar ma ku dest ji ev postê berde. Mehdîzadeyê 33 salî, berê weke rawêjkarê Wezareta Petrola Îranê kar kiribû. Lê gellek ji xelkê Îranê bawer in ku xizmatiya Mehdîzade ligel Rûhanî sedema sereke ya wergitina vê postê bû.

Havîna sala borî jî nerazîbûnek han ji aliyê xelkê Îranê ve bi rêya "Social Media" ve hate encamdan ku tê de, xelk daxwaz ji berpirsên siyasî yên Îranê kir ku hemû ew îmtiyazên ku zarokên wan ji dewletê bi dest xisitine, eşkere bikin.

Her di vê derheqê de di "August"a sala borî Wezîrê Karûbarên Derve yê Komara Îslamiya Îranê, Mihemd Cewad Zerîf, di hevpeyvînekê ligel rojnameya "Donya-e-Eqtesad", ya Îranê dibêje: "Spas ji bo Xwedê, piştî me`imûriyeta min li Netewên Yekbûyê de, zarokên min, vegeriyan Îranê û niha ligel malbatên xwe li Tehranê dijîn û kar dikin".

Herwiha, "Rasûl Tolo`î", kurê yek ji fermanderên xanenişînbûyî yê Spahê, ji ber danîna hinek wêneyên xwe ligel pilingekê li Instgram e û dana mêhvandariyeke mezin û bicoş ji bo 2 saliya keça xwe, kete ber rexneya melayek naskirî û tundajo li Îranê de, bi navê Mahdî Sadrossadat. Navbirî di Instgrama xwe de wuha dibêje: Çawa dibe ciwanek 25 salî vî qasî dewlemend be, di demekê de ku xelk heta bi zorî nikarin pûşekan bo zarokên xwe bikirin.

Bi giştî, aboriya Îranê diherife û xelkê normal yê Îranê hest bi bêzarî û mandîbûnê dikin. Asta bêkariyê gellek bilind e, kêmasî pir zor in û perê Îranê roj bi roj bihaya xwe ji dest dide.

Di "November"a sala borî de ku dorpêçên nû yên Amerîkayê li dijî Hikûmeta Îranê car din dest pê kir û petrola Îranê, banka navendî û bazirganiya derekî kire armanc, bûye sedem ku aboriya Îranê bi tewahî felec bibe.

Li gorî "Djavad Salehi-Isfahani", şarezayê warê aborî di zankoya "Virginia", heta beriya ku baykotên nû yê dewleta Trump li dijî Îranê dest pê bike, bêdadî û destengî û hejarî di Îranê de di astek bilind de bû. Sedema sereke jî sîstema hakim bi ser Îranê de ye.

"Salehi-Isfahani" di malpera xwe de wiha dibeje: "Sistema aboriya Îranê, bi yeksanî ligel xelkê hejar û dewlemend riftar nake û xelkê hejar û kêmdahat bi awayek berçav hatiye piştguhxistin."
Li gorî Reza Ekberî, lêkolerê karûbarên siyasî yê Îranê li Waşingtonê, rewşa heyî ya xirab ya aborî bûye sedema acizbûna xelkê ji fisada îdarî, partîbazî, xizmayetî û axazadeyan ku sedema serke ya wan probleman in.

"Suzanne Maloney" cîgira berpirsê progirema siyaseta derve ya ser bi dezgeha "brooking" di pirtûka xwe de ya bi navê siyastea aboriya Îranê piştî şoreşê wuha dibêj:

"Aghazadeyên Îranê ji post û desthilata xwe mifah distînin ji bo bidestxistina zaniyarên taybet, pere û pêgehên bilind yên îdarî û siysî. Ev yeka jî bûye sedema fîsadek mezin û xizm-xizmanê di Îranê de. Riftarek ku nifiş bi nifş dest bi dest dibe."

Di sala 2017`an de yek ji zarokên siyastevanên reformîst bi navê Mihemed Rêza Arif, bi danîna nivîsînekê li ser Instgramê bû sedema acizbûnaxelkê. Mihemed Reza Arif di Instgrama xwe de got ku sedema serkevtin û dewlemendbûna wî di jiyanê de, "jên"ên baş bûye. (toyên baş yên zarok pê çê dibin).

Di "Novemebr"a sala borî de dema bavê wî li "twitt"erê de daxwaz ji xelkê Îranê kir ku hemû bi hev re kar bikin û bibin yek dijî baykotên nû yên Amerîkayê, parêzerek Îranê li jêr nivîsa wî de komêntek danî û got: "Beriya her tiştî dibe xelkê Îranê ji dest "jên"ên baş xwe rizgar bikin."

"Erin Cunningham", şarezayî karûbarên Rojhelata Navîn, bi taybetî Îran, Sûriye û Îraqê ye. Navbirî xwendina xwe ya bilind di warê siyasetên navdewledî di zanîngeha Amerîkî li Parîsê de wergirtiye.

# Nûriyê Tirkîzan!






**Bûbê Eser**

Nûrî hevalekî ji herêma Mêrdînê emdamê partiyê bû. Di dawiya sala 1979`an û destpêka 1980`î partiya me dixwest dest bavêjê şerê çekdarî. Loma jî biryar hatibû girin da ku herêmên pêwîst berê bi çek bibin. Dûre jî herêmin din. Yek ji sedeman ev bû.

Sedemeke din jî ev bû wê demê rêxistina PKK dixwestin li Bakurê Kurdistanê hemû welatparêzan, partî û rêxistinên Kurdan ji holê rake da ku ew bi serê xwe tenê bimîne. Bi qavet û hêza xwe PKK hema hema zora hemû partî û rêxistinan biribû, endamên wan kuştibûn, amana tekoşîn û serîhildanê ne dida wan.

Tenê partiya me (PKD-KUK) mabû ku PKK nikarîbû bi wan. Loma jî ji bona PKK partiyê ji holê rake, emrê ku kuştina hemî endam, rêvebir û berpirsiyaran dabû. Ji ber vê biryara PKK ya li gor daxwaza dewleta Tirk, me jî xwe li gor îmkanan bi çek dikir. Şerekî xurt di navbera me de derket, di vî şerê ne di berjewendiya gelê me de bû, gelek welatparêz hatin kuştin. Dûre rewş zelal bû ku ev jî pilana dewletê bû. Ji ber ku wanPKK damezrandibûn, da ku hemû partî û rêxistinên welatparêz ji holê rake.

Di vî şerî dePKK wanda kir, loma darbeya 12 îlona 1980`î pêk hat, agir bera Kurdistanê dan, ter û hişk hemû bi hevre şewitandin. Qena`eta min a şexsî heger PKK bi ser ketiba, darbeya 12 Îlonê çê nedibû.

Hevalên me jî ji bona xwe parastin û haziriya şerê çekdarî bû ku deverên em lê xurt bi çek dikirin. Tam di vê tevliheviyê de heval dixwazin du roketên teyaran dixîne (roketatar) bigihêjînin devera... . Wir cihekî stratejî û gelekî girîng bû.

Ji ber ku Nûrî him endamê partiyê bû, him jî seyara wî hebû, hevalan rast dîtin ku Nûrî bi seyara xwe van roketena bigihêjîne cihê hewce. Wer hasil, em dirêj nekin. Nûrî xwe ji vê re amade dike. Heval roketan dixin seyara wî û dibêjin;

-Rêya te xêr be.

Nûrî seyara xwe ji qezayê ber bi Mêrdînê diherikîne, qaseta şivan dixe teybê, tu dibêje qey barê wî tuneye. Bi rehetî seyara xwe dajo. Polîsên tirkan wî di navbêra qeza û mêrdînê de didin sekinandinê. Di seyara wî di wan roketana dibînin û jê dipirsin:

-Kuro ev çine? Nûrî xwe li nezaniyê datîna û dibêje:

-Weleh nizanim.

-Ev roket in, tu çawa nizanî?

-Bawer bikin, berî ku ez jî qezê derkevim du çekdar ketin seyara min û ev di dawiya wê de bi cih kirin û gotin:

-Tê bajo em li dû te tên. Heta ku em neketin pêşiya te, tu nesekine divê tu qet nesekine.

Bi girtina wan roketan, îşkenceyên nedîtî li Nûrî dikin. Lê Nûrî yê qehreman jî her ya xwe digot û tu tişt bi destê polîsan ve berneda. Dema ew anîn qawişa ez bi xwe jî lê bûm, weke miriyekî bû.

Piştî çûyina Gardiyanan me bi lez û bez ew hembêz kir, li gor îmkanên xwe ew derman kir. Piştî demekê êdî Nûrî jî bû weke me. Lê de werin vê ecêbê ku Nûrî lîse jî qedandibû, yanî neh salan dibistana tirkan xwendibû lê dîsa tirkiya wî weke ya gundiyekî bû. Neh salan dibistan xwendibû lê tirkî fêr nebûbû. Ev yek li zîndanê jî bûbû bela serê wî. Her ku em derdiketin meşê hetmen Nûrî şaşî dikir û ji ber wê jî gelek lêdan dixwar.

Ji xwe rojên zîyaretan bûbû lêdana wî. Her gava diçû ba kesên hatibûn zîyareta wî, wî hetmen bêjeyek kurdî tevlî tirkiya xwe dikir û ji bona wê jî bi sa`etan lêdan dixwar.

Rojek ji rojên zîyaretê bû. Di lîsta ewil de ya ku wê herin cihê ziyaretê, navê Nûrî xwendin. Piştî vegera girûpa ewil Gardiyan hemû xistin hundir. Nûrî hiştin û dest bi lêdana wî kirin. Lêdaneke weha bû qet mirov nikare bêje. Û her Gardiyanan jê dipirsîn:

-Te çima bi Kurdî qise kir? Nûriyê di nava destên wan zebeniyan de digot:

-Komûtanim weleh ez bi Kurdî nepeyivîme. Tenê min got. Bavo tu careke din hat, ji min re lûfikekê bîne.


**Ez ecêbgirtî dimînim ku niha piraniya kesên ji wê zîndanê derketine, berhemên xwe bi tirkî dinivîsînin, bi tirkî dixwînin û diaxifin**

Dûre me mesele fêm kir ku Nûrî daxwaza lûfikek ji bavê xwe kirî ye. Lê tu nebêje navê lûfikê bi tirkî "Lîf"e. Ji dêlva Nûrî bêje; bavo carake din tu hat ji min re lîfekê bîne, gotiye lûfikekê bîne. Ji ber ku Gardiyanan maneya Lûfikê nizanîbûn wan jî texmîn dikirin ku Nûrî şifreyek daye bavê xwe. Ji bona vê jî bi sa`etan lêdan û îşkence lê kirin.

Aha rewşa me girtiyên zîndana Diyarbekirê ya bi navê 5 nolîyê weha bû. Ji bona bêjeyek bi Kurdî me bi sa`etan îşkence didît.Ez ecêbgirtî dimînim ku niha piraniya kesên ji wê zîndanê derketine, berhemên xwe bi tirkî dinivîsînin, bi tirkî dixwînin û diaxifin.

* Ev nivîs boçûnên nivîskar in, ku rojnameya Agirî li hember de berpirsyar nîne.

# Komara Kurdistanê berhrmeke mayînde ji bo Kurdan!



**Eskender Ce`iferî**



Roja 22'ê Kanûna Paşîn a sala 1946'an a Zayînî angu 2'ê Rêbendanê a sala 1324'an a Rojî, Komara Kurdistanê ji aliyê Qazî Mihemed ve li meydana Çarçira li bajarê Mehabadê ê Rojhilatê Kurdistanê hate ragihandin û wê hikûmeta Kurdî, ala netewî a Kurdistanê hilda. Di vê rêwresmê de Qazî Mihemed wiha sûnd xwar: "Sûndê bi mezinatiya Xwedê, rûmeta Qurana Kerîm û li ser welat û ala xwe diwxem heta dilopa dawî a xwîna min û nefesa min a dawiyê, bi can û malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo ku alên me li esmanan pêl bidin, ezê xebatê bikim."

Beriya wê jî ev navçe şahidê serhildanên Şêx Ubeydullayê Nehrî û Simkoyê Şikak bû.

Piştî ku sala 1941ê Şahê Îranê Riza Şah bi derbeyekê ket û kurê wî Mihemedriza Şah bû desthilatdarê rejîmê, wê demê serokeşîrên Kurdan ên ku hatibûne sorgûnkirin, zivirîn Kurdistanê û hewl didan desthilat û rêveberiya navçeyên xwe bi dest bigirin.

Êdî rojavayê Îranê ketibû bin desthilata Kurd û Azerbaycaniyan de û Rûsî jî ketibûne navçeyê.

Sala 1942'an li Mahabadê kovara bi navê Nîştiman bi beşdarbûna 11 kesan çab bû û weke rojnameya fermî ya Komeley Jiyanewey Kurd (Komeley J.K) hate binavkirin û kar li ser hesta netewî a Kurdan dikir. Navê vê komeleyê dihate wateya vejandina Kurdan. Piştî sê salan di sala 1945'an de bi pêşengiya Qazî Mihemed, Komeleyê dewsa xwe da Partiya Demokrat a Kurdistanê û daxwazên vê partiyê, xweserî, perwerdeya bi zimanê dayîkê, fermîbûna zimanê Kurdî û gelek xwestekên din jî bûn.

Ji xeynî Komara Agirî li Bakur û hikûmeta Şex Mehmûd Berzencî ku li Silêmaniyê hatibû ragihandin, Komara Kurdistanê jî di warê dewletbûnê de ji bo Kurdan bû tecrûbeyeke din. Kurdan êdî ji xwe re şoreşên Agirî, Simko û ên din kiribûn mînak û gelek jî ders û waneya berxwedanê ji wan hîn bibûn.

Piştî ku di 22'ê Kanûna Paşîn a sala 1946'an a Zayîn Komara Kurdistanê hate ragihandin, Leşkerê Kurdistanê angu Artêşa Kurdistanê hate avakirin ku heman Hêza Pêşmerge bû. Ew hêz ji hezaran xortên Kurd û ji leşker û hêzên wan eşîran pêk dihat ku tevlî Komara Kurdistanê bibûn û her du hêzên siwar û peya lixwe digirtin.

Komara Kurdistanê ya ku li Mehabadê bi Serokkomariya Qazî Mihemed hate ragihandin, çarde wezîr jî lixwe digirtin ku ev in; Serokwezîr: Hacî Baba Şêx, Wezîrê Karûbarên Navxwe: Mihemed Emîn Muînî, Wezîrê Karûbarên Derve: Ebdulrehman Îlxanîzade, Wezîrê Şer û Parastinê: Seyf Qazî, Wezîrê Darayiyê: Ehmed Êlahî, Wezîrê Dadê: Mela Husên Mecdî, Wezîrê Rêûbanan: Îsmaîl Îlxanîzade, Wezîrê Ragihandinê: Sidîq Heyderî, Wezîrê Post, Telefon û Telegrafê: Kerîm Ehmedeyn, Wezîrê Perwerdehî û Fêrkirinê: Menaf Kerîmî, Wezîrê Kar: Xelîl Xûsrevî, Wezîrê Ticaret û Bazirganiyê: Hecî Mistefa Dawûdî, Wezîrê Tenduristiyê: Seyîd Mihemed Eyûbiyan, Wezîrê Çandiniyê: Mehmûd Welîzade. Ew wezîrên ku di Komara Kurdistanê de de cih digirtin, Yasaya Bingehîn a komarê zelal kirin.

Di dema yazde mehên temenê Komara Kurdistanê de gelek rêxistinên aborî, leşkerî, civakî, sîstema perwerdehiyê, çandî, wêjeyî, hunerî, şanoya Kurdî, saziyên ji bo parastina mafên jinan jî hatin pêkanîn, Çapemenî hebûn û zimanê Kurdî jî bû zimanê fermî. Ev berhem û gelek berhemên din û herwisa Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê PDKÎ, ji mîratên Komara Kurdistanê ne ku heya îro jî li dijî dagirker xebatê dike.

Aboriya Komara Kurdistanê li ser bac û ticaretê birêve diçû bi rengekî ku komîsyonekê li navendên bajaran bac ji tacir û bazirganan distand û komîsyonekê jî di rêya axayan re baca gundewaran kom dikir. Herwisa Komara Kurdistanê bixwe jî çalakiyê bazirganî û ticaret dikir ji bo ku dahata pêwîst ji bo xercên hikûmetê bi dest xwe ve bîne.

Hêzên Rejîma Şayê Îranê, bi desteka Berîtanyayê di roja 17'ê Kanûna sala 1946'an de, leşkerên xwe birin aliyê dewleta Kurdistanê. Ji bo ku xelk neyê komkujkirin, Qazî Mihemed, berdewamkirina riya xwe, sparte hevalên xwe û êdî komar hate hilweşandin û Qazî Mihemed xwe radest kir.

**Beriya wê jî ev navçe şahidê serhildanên Şêx Ubeydullayê Nehrî û Simkoyê Şikak bû**

Ji bilî desteka Berîtanya, Sovyetê jî bi Îranê re lihev kiribû ku pêwendiyên wan ên aborî bi rejîma Şahê Îranê re berdewam bikin û di lihevhatina wan de hatibû destnîşankirin ku "Mijarên Azerbaycan û Kurdistanê, pirsgirêkên navxwe ne û Îran divê bixwe, van pirsgirêkan çareser bike û êdî Sovyet piştgiriyê nade van neyarên Îranê. Herwisa êdî hêzên Sovyetê û ên Berîtanya jî, ji axa Îranê bi temamî vedikişiyan."

Di roja 31'ê Adarê a sala 1947'an a Zayînî de Qazî Mihemed serokkomarê Kurdistanê, Seyf Qazî wezîrê Şer û Parastinê yê Komarê û birayê wî Sedr Qazî li meydana Çarçira a Mehabadê hatin darvekirin.

## Nerîna Lîderan



**Trump:**

“**Rewşa Îranê gellek xirabe, û ew daxwaza gotûbêjê dikin**”.



**“John Robert Bolton”:**

“**Dibe Tirkiye garantiyê bide ku êrîşî ser Kurdan nake**”.



**“Brian H. Hook”:**

“**Em tu welatekî din ji dorpêçan mi`af ankin**”.



**“Maike Pompeo”:**

“**Di meha bê de, civîneke navneteweyî li ser rejîma Îranê heye”.**

# Fobiyaya Kurd



**Selîm Zencîrî**




Fobiyaya Kurd, tewnek e ku çar dehsal in rejîma Îslamî ya Îranê bi armanca dijberîkirina pirsa Kurd û haydan û yekîtiya nasiyonalîzma Fars û hin netewên din tevî xwe dest bi raçandina wê kiriye û di çarçoveya parastin û bihêzkirina xîmên xwe de, reşandina tovê nefret, bizdandin, sivikatî, tometbarî û xwîn kiriye materyalên vî tewnî.

Rejîma Komara Îslamî hevdem li gel qorixkirina desthilatê,şidet û çavsorî jî teorîze û bi fermana cîhada Xumênî jî piraktîze kir, wate rûçikek şer`î û yasayî bi hemû cinayet û hovîtiyên xwe bexşî. Rejîmê pirsa Kurd û neteweyên Îranê ji pirsek siyasî û mafxwazî ve bi pirsek ewlehî û cudaxwazî ve, çewaşe kir û bi mîlîtarîzekirina Kurdistanê û afrandina cinayet û tepeseriyan, dîktatorî û siyaseta xwe ya mirar sîstimatîk kir ku heya niha jî bi hemû qaweta xwe berdewam dike.

Helbet bona domandina vê siyasetê jî, berdewam xwe bi alav û vêrjinên nû abdeyt kiriye.Ew bi leyîstina bi hin peyv û wajeyên derewîn û dujminkarane weke «Dijî şoreş» û «cudaxwaz» û «dardestên Îsraîl û Amerîka» û «terorîst» û «Muharib» û ...hwd, ji bilî çewaşekirina pirsa Kurd û xwastên rewa ên wan, rêber, partî û bijardeyên wê jî bi nîşangeh girtine, û hewil daye kultur û edebiyata «ji Kurd bizdiyanê» xurt bike.

Bi kurtî fobiyaya Kurd,him kirine bi pêxora siyasetên tepeserkar û Kurdkuje xwe û him jî alavek bona xapandin û rakişandina hest û soza raya giştî û besîckirina wan di çarçoveya erê û rewatîdana bi vê siyasetê.


Di vê çarçoveyê de her roj zêdetir qada medyayî bi fîlm û dukumentariyên çewaşekarane dadigrin û bi bazarkirina li ser xwîna vî gelê mafxwarî, dirêjî bi desthilata qirêj û dîktatorî a xwe didin.
Dukumentariya «bûyerên Kurdistanê»ku di 40mîn salvegera şoreşa gelên Îranê de hatiye berhemanîn, domandina heman rêbaz û siyaseta qirêj e. Çûnkî bi çewaşekirina rastiyên dîrokî, şikandina rêber û partiyên Kurd, û nîşandana dîmenek şerxwaz, nehecimî û yaxî ji Kurdan û azadîxwazên Kurd çi ji cewher û kakila doza Kurd û xebata rewa ya wan heya azadiyê naguhere. Lê ji alî din ve vê rastiyê nîşan dide ku serbarê meşandina vê siyasetê û encamdana ew hemû cinatetan, rejîm piştî 40 salan dujminatiyê, hêj bi ser neketiye û pirsa Kurd jî serbarê qurbanîdanên zaf, her zîndî û şibî burkanê dikele û xortên wê jî amadeyî her nirxdayînekê ne.

Helbet eva ne tenê siyaseta rejîma Îslamî ya Îranê, belkî ya hemû dewletên zal bi ser Kurdistanê de ye ku bi yek lojîkê nizîkî Kurdan û pirsa wan bûne û ger berê bi durûşma «Em bi Kurdan re na, bi kufrê re şer dikin» dijberiya Kurdan kirine, niha jî bi durûşma «şerê me bi Kurdan re na, bi terorîstan re ye» dixwazin dujminatiya Kurdan bikin. Helbet li pişt her du durşûman û gelek siloganên din hevşêwe de tenê yek armanc heye, ew jî fetisandina Kurdan û ji holê rakirina vê pirsê ye.Lewma bi dana van durûşman, navmala Kurdan û yekîtiya wan jî têk dane û bi parvekirina Kurdan bi ser baş û xiraban de, cehda afirandina dubendî û kûrttir kirina nifaqê û hingavtina bihevrejiyana netewеyan dane, ku mixabin heya qasekê li vê derheqê de bi ser ketine.

Lê ceribînên dîrokî nîşan daye ku lojîk û edebiyata înkar, sivikatî, berxwarkirin, xwînrijandin û fobiya nîşandana gelan bi ser neketiye û nakeve jî, û ji bilî berxwedana rewa û reaksiyon û xwarina serê dîktator û xwînmijantu encamek din nebûye; ku bêguman rejîma dijîmirovî ya Îranê jî ji wê qaîdeyê bi dûr namîne.

Ji ber ku rejîm li hundur de rastî sedan kirîz û pirsgirêkan hatiye û rewatiya xwe ji dest daye û egera serhildana xelkê li rojevê de ye,û li asta navneteweyî de jî ketiye bin givaş û dorpêçên dijwar yên aborî û siyasîde;hevsarê wê hatiye kişandin û hêdî hêdî destê wê li fitne û cinayetên deverê de jî tê kurtkirin, lewma egera guherîna hevkêşeyên siyasî û dîzanek nû ya deverê bi qazanca azadiya gelan û demokrasiyê tê texmînkirin ku eva jî bûye qapûsek mezin bo rejîmê û xew ji çavan herimandiye. Anku fobiyaya guherînakariyan şibî fobiyaya ji Kurdan wê tewnê rêsyayî û vehonandî yê rejîmê veçirîne û hemû ew sermayeguzariya ku li wan hemû salan de bi vê siyasetê kiriye, dibe bi bilqa ser avê û pûç dibe.

# Kurdistana Sûriyê di navbera helwesta Amerîka û gefên Tirkiyê de





**Ebdulezîz Qasim**

Gefên Tirkiyê derbarê pêkanîna operasyoneke leşkerî li ser navçeyên Kurdan li rojhilata çemê Firatê roj bi roj zêdetir dibin, ku Tirkiya bi hinceta dijberiya "PKK, PYD", gelê kurd û paşeroja doza kurdî armanc dike, û bi taybtî piştî dagîrkirina Efrînê û bicihkirina çeteyên opozisyona Sûriyê yên îslamî-erebî yên terorîst li Efrînê û pêkanîna kiryarên dizî û talankirin û hawirdkirina Erebên Xûta Şamê yên alîgirên rêxistina DAIŞ`ê li gund û bajarokên Efrînê û pêkanîna projeyê guhertina demografî û erebkirina navçeya Efrînê û parçekirina kurdistana Sûriyê bi mebesta ku kurd li Sûriyê nebin xwedî statûyek.

Piştî daxuyaniya Serokê Amerîka Donald Trump li heyva borî ji bo vekşîna hêzên Amerikayê ji rojavayê Kurdistanê metirsî û dilgiraniyek mezin li rex gelê kurd û hêzên Kurdan li ser rewşa rojavayê Kurdistanê û paşeroja gelê kurd peyda kir, û yekser piştî biryara serok Turmp, Amerîka ligel Herêma Kurdistanê projeyek ji bo belavkirina "Hêza Leşkerên Roj" (pêşmergê roj) li ser sînorê Rojavayê Kurdistanê-Tirkiyê pêşkêş kir, lê ew proje ji aliyê PYD`ê bi fişarên PKK hat redkirin û yekser PYD`ê bijardeya hemahengiyê ligel artêşa rejîmê helbijart û hewla pêkanîna danûstandinan ligel rejîma Sûriyê da ji bo belavkirina hêzên rejîmê li şûna hêzên Amerîka û ji bo vê çend hevdîtin di navbera berpirsên PKK û PYD digel Şamê û Rûsiya de hatin pêkanîn, û li gor daxuyaniyên berpirsên PYD`ê li ser gefên Tirkiyê yên li ser Rojavayê Kurdistanê, Rûsiya nexşereyêk dabû ji bo navbeynkariyê di navbera wan û Şamê de, lê heta niha ew hevdîtin bê encam in ji ber ku Şam mafên Kurdan qebûl nake û piştî biryara Amerîkî li ser redkirina radestkirina navçeya rojhilatê çemê Firatê bo hêzên rejîmê, çi mifayek nîne ji danûstandinên bi rejîma Sûriyê re, tevlî daxuyaniya Wezîrê derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov derbarê vekişîna hêzên Amerîkayê û giringiya vegera hêzên rejîmê li şûna wan li rojhilatê Firatê.

Piştî derbasbûna heyvekî li ser daxuyaniya Serok Turmp li ser vekişîna hêzên Amerîka ji bakurê Sûriyê, diyar dibe ku vekişîn hatiye di çarçoveyê siyaseteke Amerîkayî ya nû di Rojhilata Navîn de û dibe ti pêwendiya biryara vekişînê nebe bi gefên Tirkiyê re, her wek Turmp di daxuyaniyên xwe de da zanîn ku hebûna hêzên Amarîka li Sûriyê herî zêde ketibû di bin berjewendiya rejîma Sûriya û Îran û Rûsya de, û da zanîn ku Amerîka beşdar nabe di proseya nûjenkirin û avadankirina navçeyên di bin kontrola rejîmê û milîsên Îranê de, û xuya dibe ku ti rêkeftin nehatine pêkanîn di hevdîtinên berî hefteyekê yên di navbera rayedarên Amerîka û Tirkiyê de, û ev yek xuyaye dibe ji nav daxuyaniya berdevkê Serokkomariyê Tirkiyê Îbrahîm Kalin yên li roja 15.01. 2019`an, dayîn ku şanda Amerîkayê 5 xalên "nefermî" arasteyî me kirin, û gotibû meseleya gefên aborî yên li ser me jî bi dawî bûn", ku berî çend rojan Serok Donald Trump li ser Twitterê hişyardariyên tund dabûn Tirkiyê û diyar kiribû ku "heger Tirkiya êrîşî Kurdan bike ew ê dê aboriya tirkiyê wêran bike", herwiha Trump da zanîn ku ew dê herêmeke ewle ya bi qasî 32 kîlometre durist bike, û dibe roleke mezin ya Amerîka û Fransa hebe di duristkirina "navçeya ewle" de bê beşdariya Tirkiyê, herwiha pêşhatên nû diyar dikin ku eger heye Amerîka ji biryara vekişîna hêzên xwe ji Sûriyê vegere, û berdevka Wezareta Derve ya Rûsyayê Maria Zakharova ev yek piştrast kir û ragihand ku Amerîka ser vekişîna ji Sûrîyê ''ne cidî ye'', û Zakharova ji rojnamevanan re gotibû ku Amerîka ji bo li Sûrîyê bimîne li hincetan digere, û diyar kiribû ku Amerîka heta niha li ser vekişîna ji Sûrîyê ti gavek û tiştekî berbiçav nîşan nedaye û ew ne bawer in ku Amerîka ji Sûrîyê derkeve. Diyar dibe ku Amerîka bêdeng nabe li ser êrîşkirina Tirkiyê li ser rojhilatê Firatê, wek bêdengiya li ser Efrînê û zêdetir dê rê bigire li pêşiya her êrîşeke Tirkiyê di nav karûbarên navçeya "ewle" de ya ji aliyê serok Turmp hatiye pêşniyar kirin, ne tenê Amerîka herwiha Fransa û Birêtaniya û Almanya li dijî her oparesyoneke leşkerî ne ji aliyê Tirkiyê. Hêjayê gotinê ye ku serok Mes`ûd Barzanî gelek caran metirsiya xwe li ser Rojavayê Kurdistanê nîşan dabû, herwiha di çend rojên borî de wezîrên derve yên Fransa û Amerîkayê, wezîrê derve yê Holanda, û şêwirmendê wezareta berevaniya Amerîkayê yê karûbarê Rojhilata Navîn, herwaha bi dehan şand û dîplomatkarên mezin yên cîhanê serdana Hewlêrê kirin û li gel Serok Barzanî civiyan û pirsa kurd û çarenivîsa rojavayê Kurdistanê di wan hevdîtinan de mijareke sereke bû, û piştî hevdîtina serok Barzanî ligel Wezîrê derve yê Amerîka Mike Pompeo, yekser li roja 10.01.2019`an, Serok Mes`ûd Barzanî li Selahedînê pêşwaziya şanda serkirdayetiya Encûmena Niştimaniya Kurd li Sûriye "ENKS"ê kir û heta niha çi pêzanîn li ser wê hevdîtinê nehatine aşkerekirin, bi tenê daxuyaniya ENKS`ê bal kişandiye ku "vekişîna Hêzên Amerikayê ji Rojavayê Kurdistanê dilgiraniyek ligel Serok Barzanî li ser rewşa Rojavayê Kurdistanê peyda kiribû û wî ji bo kêmkirina metirsiyên li ser Rojavayê Kurdistanê xebatek berfireh birêve biriye, di encama keda Serok Barzanî de metirsiyên li ser Rojavayê Kurdistanê kêm bûne".

# Di pêxema nan de, du kolberên din bi teqeya hêzên nizamî bûne qurbanî



**Du kolberên Kurd xelkê yek ji gundên devera "Kotol"ê li sînorê bajarê Xoyê, bi teqeya rasterast a hêzên mizamî ên hikûmetî ve hatin kuştin û birîndarkirin.**

Şeva derbazbûyî, hejmarek ji kolberên Kurd li devera "Kotol" a bajarê Xoyê, dikevne kemîna hêzên nizamî ên hikûmetî, û di vê pêwendiyê de, kolberekê canê xwe ji dest da, û kolberekî din jî bi giranî birîndar bû.
Ew du kolberê Kurd yê bi navê "Ebdullah Yusifî" hate kuştin, û "Êhsan Xalidî" jî birîndar bû, ku xelkê gundê "Razî" ya devera Kotolê ne.

Bi gotina wê çavkaniyê, "Ebdullah Yusifî" gulleyek li serê wê dane, û dest bi cî canê xwe ji dest da, û herwisa "Êhsan Xalidî" bo çareseriya pizişkî bo yek ji navendên dermanî ên bajarê Urmiyê hate şandin.

# Çar kolberên Kurd li ser sînorê Bane û Serdeştê hatin kuştin û birîndarkirin





Pêka rapora ku gihîştiye malpera "Kurdpa"yê êwariya roja Yekşemiyê 23`ê Befranbarê, Kolberekî Kurd bi navê "Namiq Xulamî" xelkê gundê "Xori-yawa" li sînorê Hengejal a Bane bi sedema teqeya rasterast a hêzên nîzamî yên Hikumeta Îranê, canê xwe ji dest da, û du kolberên din jî bi navên "Karzan Emînzade" xelkê gundê " Xoriyawa" û "Cebar Ehmedî" xelkê gundê "Kanî sûr" bi tundî birîndar bûn.



Namiq Xulamî, di demema veguhastina wî bo navenda dermanî a bajarê Sine canê xwe ji dest da û Cebar Ehmedî, bo çareseriya pizişkî hatibû veguhastin bo  nexweşxaneya bajarê Silêmanî li Herêma Kurdistanê.
Ew sê kolberê Kurd bi bê haydarkirina pêştir, ji aliyê hêzên nizamî yên Hikûmeta Îranê ve bûne armanc.

Ji aliyekê din ve jî, çend rojan berî niha, kolberekî Kurd bi navê "Sîrwan Hesenzade" temen 25 salî xelkê Serdeşt li sînorê wî ba-jarî bi sedema teqeya hêzên nizamî yên Hikumetî  bi tundî hatin birîndarkirin.
Hêzên nizamî yên hikûmetî bi bê agadarakirina pêştir li nawçeya "Bajar" ya Serdeştê, teqe li kolberê Kurd kirine, û navbirî bi sedema kûrbûna birîna xwe, bo nexweşxaneya bajarê Urmiyê hate veguhastin.

# Pêncemîn kolberê Kurd evsal bi sedema sir û seqemê canê xwe ji dest da

**Pêncemîn kolberê Kurd evsal bi sedema sir û seqemê canê xwe ji dest daAjansa Kurdpa: Kolberekî ciwan xelkê bajarê Çaldiranê bi sedema sirê li sînorê vî bajarî canê xwe ji dest da.**

Roja Duşemiyê 24`ê Befranbarê, kolberekî law bi navê Emîr Tahirî temen 20 salî xelkê gundê Girgire a çaldiranê, bi sirê canê xwe ji dest da.

Ew kolberê Kurd di dema kolberiyê de, li ser bilindahiyên sînorê di navbera Çaldiran û Tirkiyê rastî vê bûyerê hat.

Eva pêncemîn kolberê Kurd e ku bi sedema sirê li ser bilindahiyên sînorên Kurdistanê canê xwe ji dest dide.

termê vî kolberê Kurd ji aliyê hêzên erteşa Tirkiyê ve bo bajarê Wan a Kurdistana Bakûr hatiye veguhastin û paş rohnbûna nasnameya wî, ji riya sînorê Bazergan ve bo bajarê Çaldiranê hatiye veguhastin.

Roja Şemiyê 22`ê Befranbarê jî, kolberekî Kurd bi navê Eyûb Emînî kurê Mihemed xelkê gundê Deşwan a Selmasê bi sedema sir û sermayê canê xwe ji dest da.

Herweha sê kolberên din bi navên "Yûsif (zanyar) Mihemedî esil" xelkê Pîranşarê, û Zanyar Ezîzzade kurê Silêman xelkê Pîranşarê, û Muzefer Husênî temen 35 salî kurê Elî xelkê gundê Gîsiyan a ser bi navçeya Mirgewer a Urmiyê di dema kolberiyê de bi sedema sirê canê xwe ji dest da.

# Derî jî westiyayî ne

**Zîrek Kemal**

Bêguman ev nivîsa min nakeve çarçoveya rexne yan şîroveya wêjeyî, lê tenê hewldaneke ji bo derbirîn û nîşandana têgihîştin û çêja min derbarê berhem û karên wêjeyî yên nivîskarê Kurd ê ciwan Aram Mihemed “Aram Şêx Wesanî.”

Di warê edebiyata Kurdî ya vegotinê de, bi baweriya min, Aram Şêx Wesanî yek ji nivîskarên Kurd ên jîr û ciwan e. Di hemû berhemên wî de gelek kitekit û hûrgilî hene. Ez dikarim wek nerîneke şexsî bêjim ku ez zewq û çêjeke mezin ji berhemên Aram dibînim.

Helbet mirov nikare di nivîseke wiha de behsa hemû kar û berhemên wêjeyî yên nivîskarê Kurd Aram Şêx Wesanî bike. Lewma ez di vê gotara xwe de bêtir bala xwe didim ser pirtûka wî ya çîrokan ya bi navê “Dergekanîş Hîlak in – Derî jî westiyayî ne” ku di sala (2018) de çap û belav bû.

Mîna bi sed hezaran ji welatiyên xwe, beriya 30 salan nivîskarê Kurd Aram Şêx Wesanî jî ket ber pêla êş û kovan û trajediyan. Gundê wî bi çekên kîmyayî hat bombebarankirin. Çaviyên geş û şên ên rez û bax û kaniyan hatin korkirin û miçiqandin.

Gundê wan jî mîna piraniya gundên Kurdan, gundekî wiha ye ku ji dema çêbûye, pariyê nanê xwe bi Pêşmerge û bêkes û xerîban re parve kiriye. Şik tê de tune ku van jan û bobelatan bandoreke berçav li ser kesayetî û kar û berhemên wêjeyî yên Aram kirine.

Ez hest dikim xemgîniyeke kûr di hundirê Aram de hêlîn çêkiriye û ew her bi vê êş û xemgîniyê jî berhemên xwe dinivîse. Teqezkirina Aram li ser teşe û naveroka vegotinê, hewldan e da ew bûyer û bêtar û serpêhatî di nav toz û tirabêlka cîhana modern û lezgîn de winda nebin.

Ez di nav piraniya wan serpêhatî û bûyeran de jiyame ku di kar û vegotinên Aram de wek sembol tên bikaranîn, lewma jî dema ez berhemên wî dixwînim ez çêjeke mezin jê werdigirim. Li gor min, Aram Şêx Wesanî li gelek cihan rûpelên serdema xortaniya min ji nû ve vedike. Heyamekê min çêjeke mezin ji xwendina pirtûka (Kenê Parsek) a mamoste Hesen Qizilcî werdigirt, niha ez heman çêjê ji xwendina vegotin û çîrokên Aram werdigirim.




Nivîskar di vegotina xwe de hewl nade mirov ji kesekî pasîv û hêvîşikestî bike kesekî qehreman û gernas, herwiha naxwaze hêla sor a çînayetî û veqetîna civakî bike rewatî û şeriyeta geşkirina wan îdeolojî û hîmên klasîk ku çendik û çend sal in mîna şevpest û kabûsan li ser sînga mirov lûsiyane û jiyana mirov berteng kirine û bêhn lê çikandine.

Aram di vegotina xwe de misêwa bi takekes re tevdigere û tê hestkirin ku takekes li ba Aram xwedî desthilat e bi ser temamiya hîm û tradisyonên ku bi hênceta lawazî û kêmdesthilatiyê, mirovan dikişkişînin girtîgeha siyaset û îdeolojiyên tund. Anku vegerandina heybet û maneyê ji bo takekes, takekesekî ku di nav fikrên teng de asê maye, takekesekî ku yasa û qanûnên curbicur tevgerên wî yên şexsî û normal jî sînordar kirine.

Pêwist e nivîskar takekes ji wan çarçoveyan dûr bike û wek bikerekî çalak û xwedî îrade wêne bike û wî ji wê asêgeha civakî ya berteng rizgar bike. Herwiha di berhemên Aram de hewldaneke berçav heye da ku mirov ji bûnewerekî siyasî bike bûnewerekî exlaqî.

Di pirtûka Aram Şêx Wesanî ya çîrokan a bi navê “Dergekanîş Hîlak in – Derî jî westiyayî ne” ku di sala (2018) de belav bû, behsa şerê Mîran ji bo çareserkirina êş û azara derûnî ya keçekê ku sêwî û bê bav maye tê kirin. Herwiha Aram hewl dide wargehê bîranînên nejibîrkirî bi destê gurên mirovî neyê têkdan. Hûrgiliyên evîn û tirsê di vegotina bîranînan de dihêlin hedan li xwîner nemîne û helkehelk pê bikeve.

Edebiyata Aram edebiyata vegotina trajedî û têkçûn û jiyana dijwar a mirov e. Lê bendewarî û hêviyeke kûr jî di çavê karakteran de tê dîtin. Nivîskar dixwaze bêje mirovekî reşbîn û xwedî vîn û îrade ji mirovekî geşbîn lê bê vîn û îrade girîngtir û baştir e. Nivîskar di çêkirina karakter û hûrgiliyên vegotinê de girêdanek çêkiriye û bi jiyana xwe ya realîst ve girêdaye û heta radeyeke baş tê de serkeftî bûye. Aram di xeyalê de kûr e û di naveroka berhemên wî de bedewiya wêje û estetîkê tê pelandin.

Her çiqasî hinek nîşe û têbîniyên min li ser şêweya vegotina wî hene ku mumkin bû li gelek cihan baştir û berfirehtir bûya. Roman û çîrok û janrên edebî bi giştî, mumkin e di nav çend çarçove û yasa û zagonên edebî de teşe bigirin. Ez bi xwe li dijî wan çarçove û qaliban im, lê ev nayê wateya ku sînor bi temamî bên rakirin û tevlihevkirin.

Çend mohr û xisletên sereke hene ku janrên edebî ji warên marîfî û zanistî cuda dikin. Bi dîtina min ew jî bi vê lîstika zimanî tê kirin ku bi rêya wê xwîner dikeve nav çêj û raman û sersamiyê. Li gor vê dîtinê Aram di vegotinên xwe de karîbû bi hûrbînî li ser wan hûrgiliyan kar bike. Ji ber vê yekê jî, ligel berhemên Aram, xwîner hest nake dema wî vala diçe.

Bi baweriya min, ji bo nivîskarê çîrok û roman û vegotinê bi giştî, şênberkirina ziman di formeke estetîkî û kûrbûna di nav xeyal û girêka bûyeran û forma karakteran de pir girîng e. Lê divê nivîskarê warê vegotinê wek ferhengekê be di warên zanistî û civaknasî û derûnnasî de. Tew divê şarezatiyeke wî ya baş di semiyolojiyê de jî hebe, eger ne wiha be, nivîskar nikare bi şêweyeke hûrbîn rol û maneya karakteran diyar bike û wan rolan bipsêre wan ku pêwist e bispêre wan.  Ji Soranî: Besam Mistefa

# Zimanê Kurdî

3- Cînavên koma (min), ku li pey karan (yên derhingêv û yên nederhingêv) bên, ew jî dibin berkarên nerasteder. Wek :

- Zînê diyariyek da me .
- Nêrgizê berek avête wan .

Ev her dû cînav (me, wan) berkarên nerasteder in. Ji ber ku reseniya wan her dû hevokên li jor ev e : - Zînê diyariyek da (bo) me\ - Nêrgizê berek avête (bo) wan.

4- Cînavên koma (min), yên ku li pey nav û hevalkaran tên: - Birayê te çûye gund - Ez nêzî we me bi van navlêkirinên rêzimanî hatine nasîn : - Celadet Bedirxan û Rojyê Lîsko (li jêr bandora zimanê Fransî) gotine, ev cînav (berkarê nav) in. - Dr. Cemal Nebez û Sadiq Behadînê Amîdî (li jêr bandora zimanê Erebî) gotine, ew di raweya palvedanê (îzafê) de ne.

Dr.Kurdistan Mukriyanî di "govarî Zanyarî Kurd, bergî (7).R. (245) de, wan dike berkarên tiyan, anku, berverês (tewandî)

5- Di zimanê Fransî de raweyek bi navê (Transformation) heye. Ev rawe di zimanê kurdî (K.J), de, xwe dide ber gotina "Raweya veguheztî). Anku, raweya ku ji raweyeke resen hatiye veguheztin. Di zimanê kurdî de jî ev rewaya veguheztî heye. Li gelek dever û herêmên Kurdistanê tê gotin : - Min dil heye ez herim Amedê. - Te hevalek heye. - Me (5) hespên kêşê hebûn. - Wî dostekî dilsoz heye. Ev raweya van mînakan di forma resen de, bi vî şêweyê jêrîn e : - Dilê min heye, ez herim Amedê. - Hevalekî te heye - (5) hespên me, yên kêşê hebûn. - Dostekî wî yê dilsoz heye.

6- Ji hêla rastnivîsê ve jî, hemû cînavên kesîn serbixwe têne nivîsîn, ji bilî cînavê kurtkirî (ê), ku bikar û pêrbestan ve têne nivîsîn. Wek :

- Min dayê .
- Tu jê re dibêjî .

7- Ev cînavê kurtebir (ê), ku di (K.X)de bi navê (ranawî Likaw) tê nasîn, berdewam cihê berkarên nerasteder digre: - Ez bi pênûsê dinivîsim. - (Ez pê dinivîsim) - Te pênûs da Zînê. - (Te pênûs dayê).

2 -Cînavên pirsiyarî

Rola şêwazê pirsiyarî di warê zelalkirina wate û têgehan de, roleke giring e. Gelek caran gotinin li ber guhên me dikevin û mebestên wan gotinan ji me ve baş zelal nabin. Hingê pirsiyar tenê li ber me dimînin ku em bi bersivên wan, mebest û têgehên tarî ronî bikin. Şêwazê axavtina pirsiyarî di zimanê kurdî de bi (3) şêweyan dirust dibe : - Bi cînavên pirsiyarî. - Bi alavên (amrazên) pirsiyarî. - Bi şêwazekî bê cînav û alavên pirsiyarî.

a- Cînavên pirsiyarî :

Cînavên pirsiyarî di zimanê kurdî (K.J.)de ev in:

" kî, kê, kû (ku), ka (kanî), kengî (kengê), kîjik, kîjan, çi, çilo, çon, çawa (çawan), çima, çitov (çito) çira (çire), çend, çiqas".
Her yek ji wan cînavan bi taybetiyekê tê xebitandin .

"Kî" : Ev cînav bo hişmendan (mirovan) tenê tê xebitandin û cihê navên yekjimar û pirjimara her dû zayendan (nêr û mê) digre .

Mînak : - Kî hat ? (Salar hat) (nêrê yekjimar) (Zîn hat) ( mêyê yekjimar) - Kî hatin ? ( Birayên te hatin)(nêrê pirjimar) ( Keçin hatin) (mêyê pirjimar) Cînavê (kî) weku hemû cînavên kesîn, yên koma (ez) di dem û raweyên rasteder (bê verês) de tê xebitandin.

1- Bi karê bûnê (heyinê) re :

- Dema bûrî :

- Ew kî bû li min dipirsî ?
(Reşo bû li te dipirsî) - Mêvanên we kî bûn ? (Mêvanên me xizmên me bûn)

- Dema nuho :

- Ev jina li te dipirse kî ye ?
( Dayika min e) - Ev kî ne ? ( Ev hevalên Zînê ne)

- Dema paşeroj :

- ku em bi rê ve biçin, kî yê rêberê me be ?
(Ev hevalê rênas dê rêberê me be) - Mêvanên me dê kî bin ( Mêvanên me dê Hemo û Reşo bin).

**Dom heye...**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (342)

## Daxuyaniya Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê




**Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê ji bo danasîna vê hêzê û logoya taybet bi vê hêzê, daxuyaniyek belav kir.**

Daxuyanî wiha ye;

Welatiyên Kurdistanê!

Azadîxwaz û xebatkarên riya serbestiya niştîman!

Weke ku hûn haydar in, çil sal di ser desthilatdariya Komara Îslamî re derbas dibin û tepisandina sîstematîk a gelê Kurd ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve bi awayên cuda berdewam dike. Lewre xelk û xebatkarên Rojhilatê Kurdistanê neçar bûne ji hemû şêwazên xebata rewa û yek ji wan xebata çekdarî jî, li hemberî vê rejîma dagirker Berevaniyê ji gel û niştîman bikin.
Ji bo bersivdana pêwîstiyên tevgera Rojhilatê Kurdistanê di qonaxa Rasanê de, “Hêza Pêşmergê Kurdistanê” weke pêdiviyek û bi piştevaniya mîrata tijî serbilindî a Komara Kurdistanê, di pêxema lihevgirêdana xebata Bajar û Çiya, weke baskê xurt ê Rasana Rojhilat, bi armanca tevgerên berdewam di nav xelkê Kurdistanê de û ji bo piştevaniya xebata mafxwazî û cemawerî a xelkê Rojhilatê Kurdistanê li dijî rejîma Îranê, erkên xwe ên niştîmanî bicî dike.

Hêzek ku weke kela mayînde a lihemberderketina dagirker û serkutkirinê li Kurdistanê hatiyê rêkxistin û piştevaniya xebata civaka Kurdistanê ji bo rizgariya niştîman dike û wê lihemberderketina dagirker û dar û desteyên wê li Kurdistanê, ji erkên sereke yên vê hêzê be.

Hêza Pêşmergê Kurdistanê, weke nûnerê vîna xelkê û yek ji aliyên berevaniya rewa a xelkê Kurdistanê derdikeve holê da ku bi xelkê Kurdistanê re li hemberî dujminên gel derkeve û herwisa vê peyamê jî bide dagirker ku hêza me ji şiyana keç û xortên cangorî û pêkhateyên cuda ên xelkê Kurdistanê pêk tê û parêzvaniyê ji keramet û mana îro a gelê me û pêşeroja xelkê Kurdistanê dike.

Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, adresek e ji bo nifşa nû a xebatkaran ku dixwaze li Rojhilatê Kurdistanê jiyaneke nû bide xebat û tevgerê.

Lewre jî di berdewamiya xebata netewa me de, nifşeke nû serî hildaye ku dixwaze li hemberî saziyên rejîma dîktator û dagirkariyê derkeve. Rewatiya vê lihemberderketinê jî weke hertim, ji “Mafê Çarenivîsê a Xelkê Kurdistanê” û berevanî û berxwedana rewa distîne.Ji vir ve em bi pêwîst dizanin bêjin ku logo û hêmayên “Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê” ji van tiştan pêk hatiye;

-“Qelxan”ek ku remza hêza çekdar û vîna xelkê Kurdistanê ji bo berevaniyê ye,

-“Baz” ku tê wateya hêmaya Hêza Pêşmerge ji bo cangorîtî û jiyana bi serbilindî,

-“Arm”a Komara Kurdistanê jî tê wateya pêkhatina Hêza Pêşmerge weke mîratgira Komara Kurdistanê û armancên netewî ku ji bo rewatiya dîrokî a rizgariya niştîman û serbilindiya netewî xebatê dike.

Her yek ji rengên logoya Pêşmerge jî, wareke xebat û tekoşînê nîşan didin;

“Rengê sor”, hêmaya şoreşgêrî û cangorîtiya xortên netewa Kurd li hemberî hêza dagirker û herwisa hezkirina niştîman li cem wan e.

“Rengê zer” an jî zêrîn, hêmaya ronahîkerî a Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, navûdeng, jêhatîbûn, aramî û hesta wan ji bo berevanî ji xelkê Kurdistanê ye.

“Rengê zeytûnî” ê henayî jî tê wateya aşîtîxwazbûna Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê ji bo dabînkirina armancên gelê Kurd û sembola hêz û şiyana çekdarî ye ji bo berevanîkirin ji van hizran. Ji niha û pê ve, wê ev logo di hilkeftên çekdarî, netewî û niştîmanî de li cem ala Kurdistanê bê hildan.

**Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê**

**20’ê Befranbarê a sala 1397’an a Rojî**


## Ajanek têkiliyên di navbera rejîma Îranê û Almanyayê têk dide

**Ajaneke rejîma Îranê bû sedema vê ku alozî û sarbûnek di pêwendiyên di navbera rejîma Îranê û Almanyayê de pêk bê**

Radyoya navneteweyî ya Firansayê di raporteke de ragehand ku şêvirmendekî karûbarê çandî ê erteşa Alman ku hevwelatiyekî 50 salî ê Efxanî ye, û navê wî jî Ebdulhemîd e, zanyarî dane sirwîsên Îtila`atî ên rejîma Îranê. Tê gotin ku ew kesê efxanî bi salan ajantî (casûsî) bo Wezareta Îtila`ata rejîma Îranê kiriye. Malpera înternêtî ya “Der Spiegel” ya Alman tevî weşandina vê nûçeyê ragehand ku îdareya cinayî ya Alman roja Sêşemiyê ew kes destbiser kir.

Li gora zanyariyan, wî wekî werger û şêvirmend di karûbarê Efxanistanê de digel erteşa Alman hevkarî dikir.

Wî kesî kariye zanyariyên girîng û hestiyar bide Îtila`ata rejîma Îranê. Zanyariyên li derbarê hebûna Almaniyan di Efxanistanê de, û renge jî di gellek biyavên din de, ku bo navendên ewlekariya Alman girîngî hebûne.



**Axûndeke rejîma Îranê di nexweşxaneyeke derve û xelkê nexweş ê Îranê di Îmamzadeyan de**